

Tesewura Kurdistanê ji Nezerêke Tarîxî ve: Muqayeseya Çavkaniyên Osmanî û Ewropayî

Metin Atmaca*

Kurte

Xebatên li ser tarîxa kurdî sînoren Kurdistanê di çarçoveya sînoren erdnîgarî û siyasî de nîqaş dikin. Çi erdnîgarîçîsiyasî, piraniyavanlêkolînan sînoren erdê kurdan kême zêde wekî hev pêşkêş dikin. Herçend teqrîben hemû lêkolînên nûjen ku derheqê vê herêmê de hatine kirin li ser sînoren Kurdistanê bisekinin jî, xebatên akademîk hem derbarê terzên cuda yên navê wê de hem derbarê tixûbên erdnîgarî yên guherbar û herwiha li ser merkeza Kurdistanê ya sedsalên cuda de bêdeng in. Di vê xebatê de bala min ji sînoran zêdetir li ser ferasetê ye. Ez ê hewl bidim bersivê bo vê pirsê peyda bikim ka gelo beriya dewra nûjen, gava ku osmanî û rojavayîyan digot "Kurdistan", mebesta wan çî û kû der bû?

Termên serekî: Kurdistan, tesewur, sînor, Osmanî, Ewropa, serdema navîn

Abstract

Perception of Kurdistan from a historical angle: A comparison of the Ottoman and European sources

Scholarship on Kurdish history discusses the boundaries of Kurdistan in terms of its geographical limits and the political frontier. Be it geographical or political, most of these works present the limits of Kurdish lands more or less the same. While almost every modern study on the region elaborates on the boundaries of Kurdistan, the scholarship is silent about different versions of the name as well as the changing geographical boundaries and the center of Kurdistan throughout centuries. In this article, I intend to elaborate on what and where the Ottomans and Westerners meant when they were referring to "Kurdistan" before the modern period.

Destpêk*

Xebatên li ser dîroka kurdî sînorên Kurdistanê di çarçoveya sînorên erdnîgarî û siyasî de nîqaş dikin. Çi erdnîgarî çi siyasî, zehfê van lêkolînan sînorên erdê kurdan kêr-zêde wek hev pêşkêş dikin. Herçend teqrîben hemû lêkolînên nûjen yê derheqê vê herêmê de li ser sînorên Kurdistanê bisekinin jî, xebatên akademîk li ser van xalên hanê bi giştî bêdeng in: şeweyên cuda yê navê welatê kurdan, tixûbên wê yê erdnîgarî yê guherbar, û merkeza Kurdistanê di sedsalên cuda de. Di vê xebatê de bala min ji sînoran zêdetir li ser ferasetê ye. Bi gotineke din, di vê xebatê de, ji firehiya erdê kurdan û hidûdên mîrgehên wan zêdetir ez dixwazim li wê yekê binêrim ka rewşenbîr, şair û erdnîgarînasên osmanî û ewropayî çi fikr dikir dema wan behsa Kurdistanê dikir. Lê dîsa jî ez ê nexşe û xebatên dîrokî, ku hin caran terîfa nediyar hin caran jî diyartir a sînorên kurdî dikin, bi kar bînim. Ez ê hewl bidim bersivekê bo vê pirsê pêşniyar bikim: Beriya dewra nûjen, gava ku osmanî (ne tenê tirk, lê hemû pêkhatyên di nav sînorên împêratoriyê de) û rojavayîyan digot “Kurdistan”, mebesta wan çi û kî der bû? Ji ber ku lêgerîna bersivekê bo vê pirsê hewceyî kedeke gelek zêde ye, ez ê hewl bidim vê pirsê di çarçoveya herêmeke xuyatir û bertengtir de, ango di çarçoveya senceqa Silêmanî an Baban de, wek ku di nivîsên pêşiya serdema modern de dihat zanîn, nîqaş bikim.

Hê ji berê ve, osmaniyan xwe li hemberî farisan (*eceman*) û ewropayîyan (*frenkan*) bi cih dikir. Bi pejirandina texeyula romî bi rêya bîzansiyan, osmaniyan îmajê xwe wek rûm (*rom*) belav kir û xwe li hemberî edebiyat, siyasî û erdnîgariya îranî danî. Lewra jî *rûmî* û *ecem* bi hev re hatin hevcothkirin û di demên pêşbazî û berhevdanê de wek eksê hevdu hatin bikaranîn. Ev yek zêdetir di warê helbestan de, lê herwiha di dîn û siyasî de jî xuya bû. Ji ber vê yekê, di fikr û ramanên osmanî yê demên berê de du dinyayên ji hev cuda û herwiha hevsînor di warê erdnîgarî û ferhengî de cih girtibûn. Lê belê, gava ku mirov navbera hevokan dixwîne, mirov dibîne ku derbarê xetên wan sînoran de cudatî hene. Di zehfên cîwarên ku di navbera van her du dewletan de mabûn bi piranî kurd û komên etnîk û olî yê din niştecih bûn. Ji ber nakokiya li ser tixûbên her du dewletan, ku hem jî aliyê osmanî û hem îraniyan wek *serhed* dihatin binavkirin, bo demeke dirêj ev herêm wek *terrae incognitae* ango “erdên nenas” ma.

* Versiyoneke pêştir a vê gotarê bi sernavê “Change and Continuity in the Perception of Kurdish Lands in Western and Eastern Literature” li konferansa “On the Outside Looking in: a Kurdish Studies Conference”, ku li University of Central Florida roja 27 kanûna paşîna 2015an hatibû lidarxistin, hat pêşkêşkirin. Ji ber vê yekê, ez spas li Muslih Mustafa, serokê Zanîngeha Soran û Tyler Fisher dikim ji bo rêxistina konferansê û vexwendina wan. Min divê herwiha spasî edîtorên Derwazeyê, bi taybetî Metin Yüksel û Ergin Öpengin bikim ji bo têbîniyên wan û harîkariya wan di qonaxa amadekirina kurdiya vê meqaleyê de.

Di çavkaniyên meşhûr yê ewropayî û osmaniyan de, halê nenasbûnê, bi taybetî ji bo erdê kurdan yê di navbera Mûsil-Heleb û hê li jortir heta bakur-rojava û Meletya, heman bû. Ji bo van deveran Cemal Kafadar dibêje ku ev “*deverek an herêmeke gewr a întîqalî ye, ku eşîrên tirkmen bi awayekî azad bi eşîrên ereb û kurd ên Mezopotamyaya bakur tev li hev dibûn.*”¹ Sînorên navbera tirk, faris û ereban nenîşankirî bûn, tevî ku li ser van sînoran bi piranî kurd û tirkmen û herwiha komên nemisilman ên wekî ermenî, asûrî (aşûrî), keldanî û yehûdî serdest bûn.

Tesewura Kurdistanê di helbestan de

Ev yek ji bo Fuzûliyê şair wisa bû. Ji bo Fuzûlî, ku “*Tirkmenekî ji Kerkûkê û yek ji birêztirîn şairên edebiyata tirkî ya osmanî û azerî bû, sînorê girîng ne di navbera Sûriye û Rûmê de, lê di navbera Bexda û Rûmê de bû.*”² Lê li aliyê din, Melayê Cizîriyê (1570-1640) helbestvan û sûfiyê navdar ê kurd, Kurdistanê dide ber şehîrên Îranê û heta Çînê û bi wê yekê sînoran nîşan dike ku mîrên kurdan jî sînorên fireh û elaqe li gel milletên din hene:

*Tenha ne Kurdistan didin Şîraz û Yeng û Wan didin.
Her yek li ser çavan didin hem ji Espehan têtin xerac.*³

Sînorên feraseta Melayê Cizîrî ya li ser Osmanî û Sefewiyan tenê bi mekan û erdnîgariyê ve sînorkirî nîne, belkî ew seh û hizrên wî di warê simbol û karakteran de jî xwe didin der. Melayê Cizîrî feraseta xwe ya erdnîgarî ya derheqê Kurdistanê de li ser xebata Yaqût el-Hemewî ava dike. Jînenîgarnivîs û pisporê erdnîgariyê yê ereb ê sedsala 13an, Yaqût îbn ‘Ebdullah el-Rûmî el-Hemewî (1179–1229), di xebata xwe ya ansîklopedîk a li ser cîhana misilmanan de, bi sernavê *Mu’cem el-Buldan* (Ferhenga Welatan), gelek amajeyan bi erdê kurdan dike. Gelek caran gava behsa Mezopotamya û bakurê rojavayê Îranê dike wan deran wek axa kurdan û wek *îqlîm el-rabî’* (devera çarem) bi nav dike. Hem Melayê Cizîrî hem jî Ehmedê Xaniyê helbestvanê sedsala 17an pesnê eşrafên kurd wek hakimên devera çarem didin. Xanî Kurdistanê di navbera xakên rûm, ecem, ereb û gurciyan de bi cih dike:

*Her mîrekê wan bi bezlê Hatem
Her mîrekê wan bi rezmê Ristem*

*Bif’kir ji ‘ereb heta ve gurcan
Kirmancî ye bûye şubhê bircan*

*Ev rûm û 'ecem bi wan hisar in
Kirmanc hemî li çar kenar in*

*Herdu terefan qebîlê kirmanc
Bo tîrê qeşa kirîne amanc⁴*

Di beyteke din de, Xanî kurdan bi milletên derdorê dide ber hev û hêvî dike ku kurd payeyek wek hakimên hemûyan bigirin:

*Ger dê hebûya me ittifaqek
Vêk ra bikira me inqiyadek*

*Rûm û 'ereb û 'ecem tamamî
Hemiyar ji me ra dikir xulamî*

*Tekmîl dikir me dîn û dewlet
Tehşîl dikir me 'ilm û hikmet⁵*

Kurdistan di çavkaniyên osmanî de

Mefhûma nediyariya van navçeyan heta nîveka sedsala 19an dewam kir, wextê ku di muzakereyên li Erziromê yên salên 1843-47an komîsyoneke ji endamên osmanî, qecer, brîtanîyayî û rûsî hewl dan ku sînorekî di navbera her du dewletan de diyar bikin. Bi rêya vê encumenê, Brîtanîya û Rûsyayê hêvî kir ku arê dewleta Osmanî û Îranê bikin “*ji bo peymaneke teqez û karîger li ser mucadileyê wan a li dijî hev li herêmê û ji bo diyarkirina devera sînorê ya ku xetên nexşeyê dê lê bihatana kêşan.*”⁶ Hem Îranî hem jî Osmanî *ferman*, nexşe û gernameyên kevn – wekî *Cihannüma* ya Katib Çelebi – bi kar anîn da ku doza xwe ya li ser hin deveran, bi taybetî Muhammere (Xorremşehra îro), Zohab û Silêmaniyê, biçespînin.⁷ Herwiha, bi nîşandana ravekirinên Katib Çelebi wek delîl – ji ber ku li ser wê mohra siltan hebû – Îranê doza herêmên Ahiska, Wan, Qers û Bazîdê dikir û herwiha daxwaza nasîna heqê xwe ji bo bajarê Silêmaniyê dikir.⁸ Têvî kitêba Katib Çelebi, Enveri Efendiyê nûnerê dewleta Osmanî ev çavkaniyên hanê wek delîl pêşkêşî nûneran kirin da nîşan bide ku bi dirêjîya sedsalan Silêmanî beşek ji împaratorîya Osmanî bûye: *Düstur’ul İnşa*, ku di nav de gelek belge ji name û peymanên bi Îranê re hebûn û ji aliyê Reisü’l-Küttab ve di sala 1643yan de hatibû berhev kirin. Herwiha, *Tarih-i Naima* (Dîroka Naîma) ya Mustafa Naima Efendi û *Gülşen-i Maarîfa* Feraizi-zade du çavkanîyên din ên belgeyî di wan danûstandinan de hatibûn.⁹

Cihannüma ne tenê ji aliyê osmanî û îraniyan ve wek delîla heqên xwe li ser xakê hat bikaranîn; herwiha ew ji terefê rojavayîyan ve jî gelek caran dihat neqlkirin.

Rojhilatnasekî awusturyayî yê sed sala 19an bi navê Joseph von Hammer ji vê xebata Katib Çelebi pir îstifade dike. Bi rastî, berî ku ansîklopediya xwe ya deh-cildî ya li ser dîroka Osmanî di salên 1830yan de biqedîne, von Hammer beşên *Cihannüma* yên li ser herêmên Balqan ên împatoriya Osmanî wergerandin bo almaniyê.¹⁰ Heta dawiya sed sala 18an û destpêka sed sala 19an, nexşeyên von Hammer ji aliyê dîrokzan û erdnîgarîzanên li Ewropayê pir hatine bikaranîn gava ku dîplomat, gerok û nexşekêşên (îng. *cartographer*; fr. *cartographe*) fransî û îngilîzî hatin van deveran û nexşeyên xwe çêkirin. Dîsa jî nexşeyên wan bi qasî yên Katib Çelebi deqîq û bihûrgilî nebûn. Her çend xebateke ji nîvê sed sala 17an be jî, *Cihannümayê* tesîreke xwe ya yekser hebû li ser têgihîştin û feraseta erdnîgarî di sed salên 18 û 19an de.

Tevî xebata daxuyaniya xwe ya biteferuat, Katib Çelebi Kurdistanê di nexşeyên xwe de nîşan nade. Mîrov erdên nenas di nexşeyên Enadol û Îranê de, ku bi piranî kurd û ermenî lê dijîn, dibîne. Herwiha dema mirov navbera hevokên xebata wî dixwîne, bi salix û teferuatên herêmê re neqş eşkeretir dibe. Piştî pênasîna çend deverên ku kurd tê de niştecih in, wek Wan, Adilcewaz, Bedlîs, Mûş, Erzîrom, Hekarî, Mûsil, Sêrd, Diyarbekir û çend herêmên din, ew dawiyê dest bi qala Kurdistanê dike. Bi kurtasî behsa eslê kurdan dike û dû re dikeve nav gengeşiyên wek ka kurd ereb in yan na. Xakê ku kurd lê niştecih in heta Meres û Meletya mezin dike. Li gor raveya wî, axa kurdan ji 18 wîlayetan pêk tê. Piştî çend pêşhukmên derheqê kurdan de, Katib Çelebi dibêje ku kurd ehlê sunnet û şafi'î ne.¹¹

Di vegotina Katib Çelebi de merkezê Kurdistanê li Cizîrê xuya dike ji ber ku ev zehftir li ser wê herêmê radiweste. Heman salên ku Katib Çelebi *magnum opusa* xwe ango *Cihannüma* temam kir, Evliya Çelebi ji Diyarbekir, Mêrdîn, Bedlîs, Wan û bajarên din derbas dibû, ku wî ew dever wek Kurdistan bi nav dikirin. Li çav Katib Çelebi, Evliya Çelebi agahiyên gelek deqîqtir û hûrtir li ser axa kurdan dide. Diyarbekir û herêma li derdorê wek “eyaleta Diyarbekra Kurdistan”¹² bi nav dike. Evliya gava tenê qala Diyarbekirê dike dibêje “eyaleta Kurdistanê”; lê gava dibêje “diyarê Kurdistan” mebesta wî devera berfirehtir a Îraq û bakurê rojavayê Îranê ye.¹³ Ya rast, ew terma “Kurdistan”ê ji bo Wan (*Kürdistan-ı Van*), Soran (rojhilat û bakurê Hewlêrê) û Bedlîsê jî hiltîne. Herwiha, ji bo Evliya, Kurdistana Osmanî û Kurdistana Sefewî (*Kürdistan-ı Acemistan*) jî ji hev cihê ne.¹⁴

Di gernameya xwe de, Evliya biryarê dide sînorên erdnîgarî yên Kurdistanê yên berfireh bide xuyakirin:

Bi navê Kurdistan û sengistan (xakên zûr), ev axeke fireh e, ku tê de 70 cihnişînên cuda hene. Goşeyeke wê ji aliyê bakur yê

Erzirom û Wanê dest pê dike heta Hekarî, Cizîr, Amêdîye, Mûsil, Şehrezor, Herîr, Erdelan, Bexda, Derne, Derteng û Besrayê. 6000 eşîr û êlên kurd di navbera Îraq û Enadolê de ne (*Irâkî Arab ile Âli Osmân mâbeyninde*), (...) ger ew nebûna asteng di navberê de (*sedd-i sedid*), miletê ecem dikaribû bi rehetî erdê Osmanî (*diyar-ı Rum*) dagîr bikira.¹⁵

Herwiha îlawe dike ku piraniya kurdan jî mezhebê şafî ne. Piştî kişandina tixûbên Kurdistanê, Evliya axirî şukr û dua dike ku Kurdistan di navbera du dewletan de ye û ku her wisa bimîne.¹⁶

Tevî teferuatên ku Evliya li ser Kurdistanê pêşkêş dike, teqrîben nîv sedsalekê piştî wî Mustafa Naima, dîroknivîsekî dîwana Osmanîyan, xebata xwe ya dîrokî tamam kir, lê belê, balkêş e ku ew mîna Evliya ravekirinên dûrdirêj nade. Naima jî gelek referansan dide axa kurdan. Li cihekî qala şêxekî neqşibendî yê qedrbilind dike ku li bal tevahiya *memalikê Kurdistan* bi xweşî hatiye qebûlkin. Li nav wan memleketên Kurdistanê bajarên wek Erzirom, Mûsil, Riha û Wan rêz dike.¹⁷ Di xebata xwe de bi awayekî cuda qala Diyarbekirê jî dike, ji ber ku heşt ji nozdeh senceqên wê eyaletê bi destê hakimekî kurd dihatin birêvebirin. Ji ber vê yekê çendek ji wan senceqan bac didan. Naima ne tenê behsa kurdên li Kurdistanê, lê ya kurdên li deverên din jî, wek yên li Sêwas, Çorum û Yozgatê, dike. Di behsa xwe ya li ser van herêman de nisbeten yeksertir pê de diçe. Bo nimûne, gava rûdaneke li Sêwasê qewimîbû vedigêre, dibêje ku bi qasî hejmara tirk, kurd û tirkmenan û pêxwasên din, komeke bi heman hejmarê jî leşkerên osmanî kom bûn û li dijî hakimê wê deverê bi hev re meşîyan.¹⁸

Bi derbasbûna demê re, bi taybetî bi xebata Evliya Çelebi, mirovên ehlê qelemê li welatê Osmanî ji Kurdistan û kurdên li Enadol, Îraq û Bîladê Şamê bêtir agahdar bûn. Bi her sedsalê re amajeyên zêdetir bi kurdan hatin kirin û li şûna amaje û derbirinên giştî yên deqîq û xastir xuya bûn. Lê belê, divê mirov vê yekê jî eşkere bike ku ev behs û amajeyên zêdetir ên li ser kurdan hingê zêdetir dibûn dema serhildanek diqewimî an jî rûdaneke bala paytextê dikişand. Tevî vê yekê, ji bo wê dewrê, bi taybetî ji bo sedsala 18an, em xebateke hemtayî *Seyahatnameyê* li ser welatê kurdan nabînin.

Du versiyon, du gerdûn

Gelek lêkolînavan sînorên Kurdistanê di çarçoveya tixûbên erdnîgarî de nîqaş dikin û tixûbên ku pêşkêş dikin kê-m-zêde yek in. Ji ber vê yekê jî em berê xwe nadinê ka Kurdistan li ku ye û sînorên wê çi ne, ji ber ku gelek çavkanî û nexşe li ser vê pirsê agahiyên kafî didin. Pirsê ku bala min lê ye ew e ka dema tarîxnivîsên

osmanî û rojavayî qala Kurdistanê dikir, bi taybetî di nêveka pêşîn a sedsala 19an de, mebesta wan çî û kî der bû. Tevî ku teqrîben her lêkolîna nûjen a derheqê vê deverê de ku li ser sînorên Kurdistanê disekine, derbarê versiyonên cuda yên vî navî de lêkolînên akademîk bêdeng in. Drouville bala me dikişîne ser wateyên cihê yên “Kurdistan” an belkî “Kordestan”. Ew balê dikêşe ser ferqa di navbera “Kurdistan” û versiyona wê ya bi farisî “Kordestan” de. Drouville “Kurdistan” wek “welatê ku kurd lê niştecih bûne” terîf dike, ku ew hem axa Îranê hem axa Osmanîyan dide nava xwe. Lê belê, “Kordestan” îşaret bi “hikûmeta Muhemmed Alî Mîrza” dike.¹⁹ Bi gotineke din, ew “Kordestan”ê bi wateyeke siyasî wek wîlayetê li rojavayê Îranê tê digihe.

Di bin îdareya Osmanîyan de, navê “Kurdistan” bi giştî beramberî wan hemû herêman yên ku kurd tê de piranî bûn dihat hilanîn. Lê belê, bo demeke kurt, ji 1847an heta 1867an, Osmanîyan wîlayetek bi navê “Kurdistan” damezirand.²⁰ Wekî din, navê Kurdistanê cara pêşîn ji aliyê Selçûqîyan ve hat gotin. Paşê, li Îranê jî ji dema Sefewîyan heta îro heman nav hate bikaranîn. Em di vê xebatê de nîşan didin ku du “Kurdistan” hatine behskirin: Kurdistana Osmanî û Kurdistana Îranê. Dema em behsa Kurdistana Osmanî dikin, em bi giştî wan herêman nîşan dikin ku niha wek Kurdistana bakur û Îraqê jî tê nasîn û wîlayetên Hekarî û Şîrnexê jî di nav de tene hizrkirin. Piştî 1800an, çavkaniyên Osmanîyan navê Kurdistanê zêdetir bo mîrgeha Babaniyan û kêmtir ji bo mîrgehên din bi kar aniye. Li gorî çavkaniyên Osmanî, Kurdistan ji mîrgehên Botan, Hekarî, Badînan (Amediyê), Soran (Rewandiz) û Babaniyan pêk tê. Hinek kesan di sedsala 19an de Bedlîs jî li wê lîsteyê zêde kiriye. Adrien Dupreyê gerokê frensî, dema navbeyna salên 1807 û 1809ê, Kurdistan (bi nivîsîna wî “Curdistan”) ziyaret kiriye, lîsteyeke mîrgehên kurdan (“*les principautés Curdes*”) çêkiriye ku tê de mîrgehên wek “Soran, Baban, Badinan, Tchambo [Hekarî], Bottan û Bitlis” hatine hilanîn.²¹ Dema ew behsa Kurdistana Îranê dike, ango ev cihên ku mîratiya Erdelan lê ye, carinan mîrgeha Mukriyan jî, ya li rojavayê Urmîyeyê, tê de bi cih dike.

Baban: Mîrgeh, paytext û mîrên wan

Dem a digehin sedsala 19an, em dibînin ku gelek dîroknivîsên osmanî, gava behsa Kurdistanê dikin, îşaretê bi bajar û deverên Şehrezor (derdorên Kerkûkê jî tê de) û senceqa Babaniyan dikin.²² Yek ji wan dîroknivîsên sultanên Osmanî kesekî bi navê Şanizade ye, ku ev behsa begên Kurdistanê yên Koy, Baban û Şehrezorê dike. Ihtimal e ku Şanizade yekemîn dîroknivîs e ku dibêje başûrê Kurdistanê di siyaseta tevahiya Kurdistanê de roleke mezintir dileyîze. Wê demê mîrgeha Babaniyan li herêma û di nav hemû mîrgehên de ya herî raser bû. Şanizade dibêje ku Osmanîyan ji Îranê dixwast ku hukmê Kurdistanê bihêlin û paşayên Babaniyan yên reviyayî bo Îranê teslîmî dewleta Osmanî bikin.²³

Ji serê sedsala 16an heta 1784an, merkeza mîrgeha Babaniyan gundekî bakurê Şehrezorê bi navê Qalaçolan bû. Piştî 1784an, paytextê xwe ji Qalaçolanê çend kîlometreyan veguhast bo bakurê Milkhîndi û navê Silêmaniyê lê kir.²⁴ Wê demê, ji ber şer û mucadeleya li gel mîrgehên Erdelan û Soran û cîranên xwe yên din, sînorên mîrgehê her di guherînê de bûn. Carinan erdên wan mîrgehan, wek deverên Kerkûk, Koy, Herîr, Şehrîbazar û Pijder, ji wan distandin. Mesela, Xane Paşa (1721-1730) erdê Erdelanê dagîr kir û li gel wê dagîrkirinê tesîra binemala Baban ji Kerkûkê heta Hemedanê fireh bû.²⁵ Çaxa ku keşeyê katolîk Campanile li dor 1810an herêm ziyaret kir, got ku Qaraçolan, Karadar, Baziyân, Mêrgu, Emar Menden, Heçîler, Serduç Kerabe, Korroxyoy, Serspî li gel Erbîl, Kerkûk û Koy-sancax di bin rêveberîya mîrgeha Babanan de bûn. Lê belê, binemala Baban bi xwe bêtir bi bajarê Silêmaniyê ve sînorkirî bû. Bi taybetî piştî 1823yan, dema ku peymanî Erziromê hate bestin, malbata Baban ji Silêmaniyê hatin dûrxistin, û heta 1851ê hukmê binemalê bi tenê li ser paytext û derdorên wê mabû. Sebebeî vê rewşa wan ew bû ku artêşên faris û tirkan li Silêmaniyê bi cih dibûn, û sebebê din jî ew bû ku Mîre Koreyê Rewandizê, cîranê Babanan yê li bakur, ji wan hêzdartir bûbû.²⁶

Wextê ku belgeyên Osmanî behsa Kurdistana Îranê dikin, ew li wir bi taybetî navê Kurdistanê hiltînin. Ev rewş bi taybetî hingê berçav dibû gava Bexdayê bo Stenbolê nameyek li ser meseleya kurdên Îranê dinivîsî. Lê belê, gava ku behsa Kurdistana Osmanî derbas dibû, wan bi navê Kurdistanê amaje bi çî cihan nedikir. Li gel vê yekê ku nav û amajeyên giştî bo mîrgehên kurdan bi kar dianîn, Osmanîyan navê Kurdistanê bo herêma mîrgehên Babanan emilandiye. Hinek caran, bi taybetî demên ku şer û pêkdadan li gel Îranê çêdibûn, meseleya Kudistanê (“Kurdistan maddesi” carinan jî “Baban maddesi”) bêhtir bo erdê Babanan dihate gotin. Nameyek ji Davud Paşayê waliyê Bexdayê bo seresker Rauf Paşa, ya bi tarîxa 20ê adara 1824an (19 receba 1239an ya hicrî) dibêje “ev pirsên têkilî meseleya Kurdistanê hatine helkîrin” (*Kürdistan umurundan maâda olan mesâlih halledilmiş*), ji bilî meseleya “paşayên Kurdistanê” yên ku hêj li gel Îranê tifaqê dikin.²⁷ Di wê nameya xwe de, mebesta Davud Paşa bi “meseleya Kurdistanê” senceqa Babanan e û bi “paşayên Kurdistanê” jî amaje bi mîrên Baban dike.

Serekên mîrgeha Babanan, ji bilî nasnavên “paşa” an jî “muteserrifê Baban” (li demeke direngtir “Süleymaniye mutasarrıfı”), herwiha bi navên “mutasarrifê Kurdistanê” yan “paşayê Kurdistanê”²⁸ jî dihatin gazîkirin. Mîrgehên din ên di nav Kurdistana Osmanî de bi navê wîlayet an jî mîrgeh, wek “Van vilayeti”, “Hakkari Sancağı” an “Bayezid Sancağı”, dihatin binavkirin. Ev deverên ku kurd lê niştecîh bûn, wek Erzirom, Wan, Qers, Mûş û Bazîd, gişt bi hev re bi terma “Serhed”, ku bi vî navî herêma bakurî ya li ser sînoran destnîşan dikir, dihatin binavkirin.²⁹

Di nav belgeyên Osmaniyan de name û fermanên ku behsa Kurdistanê dikin di heman demê de gelek caran navê Babaniyan jî hiltînin û mebesta wan Babanî ne; lê belê ev yek ji bo Bedirxaniyan ne wisa ye. Gelek wesîqe behsa “Bedirxan begê qaymeqamê Cizîrê,” (*Cizre Kaymakamı Bedirhan Bey*)³⁰ yan “Bedirxan begê mutesellimê Cizîrê” (*Cizre Mutesellimi Bedirhan Bey*)³¹ dikin. Heman tesbît ji bo Mîrê Kore jî, an jî wek di belgeyên Osmanî de tê, “Mehemed begê Rewandizê” (*Revanduz Beyi Mehmed Bey*), rast e. Hindek belge li ser “Mehemed begê Rewandizê” diyar dikin ku şafî bû û di şerê li gel Îranê de gelek harîkariya dewleta Osmanî kir.³² Di nameyeke din de, Ali Paşa, di sefera xwe ya Bexdayê de behsa “Mehemed begê Rewandizê “Revanduzlu Mehmet Bey” dike û dibêje ew û “muteserrifê Babanan” çûne ser Bexdayê.³³

Nêrîna Ewropiyên li ser mîrgeha Baban

Ji bilî çavkaniyên osmaniyan, gelek seyahetname û ferhengên coxraffî yên ewropiyên (bi taybetî yên îngilîz û fransiyên), gava behsa Kurdistanê dikin îşaret bi Babanan dikin. Du kitêbên ewropiyên ên berî serdema modern bi taybetî berê xwe didin Babanan. Keşeyê katolîk ê ji Vatikanê bi navê Maurizio Garzoni, ku salên 1770an li Amediyê bû, qala “pênc mîrgehên mezin ên misilmanan” ên Kurdistanê dike. Garzoni navên wan wiha hiltîne: “Bitlis, Jazira, Amadia, Julamerg û Karacholan”, ku beramberî Bidlîs, Cizîr, Amêdî, Colemêrg, û Qereçolan in. Piştî vê agahiyê, ew dibêje ku mîrgeha Babanan, xasma “*piştî ku hukmê xwe gihandiye ser Koy Sancaxê (Sorani)*”, bûye navenda “*herî mezin û hêzdar*”.³⁴ Ji bilî navên mîrgehan, Garzoni meziniya erdê Kurdistanê bi rêjeya hespajotînê diyar dike û dibêje “*dirêjiya wî welatî 25 roj û firehiya wî jî bi qasî 10 rojan e*”.

Keşeyekî din ê katolîk bi navê Campanile sih sal piştî Garzoni digihe nav kurdan. Ew jî dibêje ku mîrgeha Babanan mîrgeha “herî mezin, herî hêzdar û herî xweş” a Kurdistanê ye. Ew jî navê heman mîrgehên ku Garzoni behs kiribûn hiltîne; lê belê, navê du mîrgehên din, wek “Sorani” û “Babani” lê zêde dike.³⁵ Li gel ku Garzoni navê paytextê Kurdistanê nedabe jî, Campanile diyar dike ku ji ber girîngiya ticarî û xweşiya wê, navenda Kurdistanê Bedlîs e. Lê herwiha dibêje ku tenê “*hinek hez dikin wir [Bedlîs] wek paytextê Kurdistanê bi nav bikin*,”³⁶ anku bi nezera Campanile ji ber girîngiya wê ya siyasî Silêmanî ji Bedlîs û deverên din girîngtir û bihêztir bû.

Ji bilî zanyariyên wan her du keşeyên îtalî, çavkaniya herî girîng a li ser Babanan xatirat û seyahatnameya James C. Rich ya bi navê *Narrative of a Residence in Koordistan* (“Qiseta Heyameke li Kurdistanê”) ye. Nivîskarê kitêbê bi piranî li nav mîrgeha Babanan maye û bi navê “Koordistan” behsa Babanan û merkeza wan a Silêmaniyê dike.³⁷ Ew di dawiya kitêba xwe de behsa belgeyeke dirêj dike

ku lîsteyek e li ser “dewr û heqîqetên derbarê dîroka Kurdistanê” (*Dates and Facts connected with the History of Koordistan*) û dibêje ku paşayên Babanan ew kaxez nîşanî wî daye. Di wê lîsteyê de bi piranî behsa serhatiyên binemala Babanan heye, lê herwiha hindê amajeyên derheqa mîrên kurdan ên din jî hene. Herwiha behsa desthilatdarên Osmanî û Îranê jî, xasma yê heyamên ku têkiliya mîrgeha Baban bi wan re hebû, tê kirin.³⁸ Dema ku Rîch behsa erdê Babanan dike, ew navên “Turkish Koordistan” (Kurdistana Tirkan/Osmanî), “Bebbeh Koordistan” (Kurdistana Bebbeyan) û “Southern Koordistan” (Kurdistana Başûr) jî bi kar tîne.

Hindê çavkaniyên din ên ewropayî behsa Babanan û peywendiyên wan ên li gel Kurdistanê dikin. Di nûçeyekê de, ji 7ê çileyê pêşî ya 1824an, li ser êrîşa Îranê bo ser Bexdayê, kovara *Christian Secretary* radigihîne ku waliyê Kirmanşahê Mihemed Alî Mîrza “*dest danî ser Silêmaniyê baregeha paşayên Kurdistanê.*”³⁹ Di wan çavkaniyan de mîna ku Baban beramberî Kurdistanê be behs lê tê kirin û paytextê wê Silêmanî jî wek “paytextê Kurdistana başûr” tê hilanîn.⁴⁰ Gerokek ji Îngilîstanê bi navê William Heude resmekî Silêmaniyê çêdike û dideyne serê kitêba xwe û li bin resmî wiha dinîvise: “Sulimaney, the Capital of Kurdistan” (Silêmanî, paytextê Kurdistanê).⁴¹

Em dikarin heman ferqa di navbera Baban û mîrgehên din de di ser nasnavan re jî bibînin. Mesela, pîraniya mîrên kurdan nasnavê “beg/bey” an jî “muteserrif” digirin; lê belê, serokên Babanan nasnavê “paşa” digirtin. Dibe ku Stenbolê ev nasnavê dabû wan. Ev nasnav bi piranî ji aliyê sultan an jî waliyê wîlayetê ve dihatin diyarkirin. Ji bilî van nasnavan, belgeyên osmaniyan yê sed sala 19an mîrên Babanan bi navê “mîrê mîran” didane nasîn, lewre mîrên Baban mîna *primus inter pares*, anku yekemînên di nav yeksanan de, bûn. Sala 1837an, bi awayekî fermî nasnavê “mîrmîran” (Tr. *beylerbeyi*, mîrê heî hêzdar ê herêma xwe) li Silêman Paşayê Baban hat kirin. Di heman belgeyê de hatiye ku “*nîşana mîrmîranî li Silêman Paşayê mutasarrifê Babanan û nîşana kapıcıbaşı (serdergevan) jî li kurê wî Ehmed Paşa bê bexşandin.*”⁴² Herwiha, yek ji hêzdartirîn mîrên Babanan, Evdurehman Paşa (1788-1813), di çavkaniyên fransiyî de bi navê “mîrmîran” derbas dibe.⁴³

Xulase

Dawiyê, em dikarin bibêjin ku sînor û merkezên Kurdistanê her tim dihatine guhartin. Bi gotineke din, merkeza hêza Kurdistanê her dewr eynî nemaye û ji dewrekê bo dewreke din bûye bajar, binemal an mîrgeheke din. Heke Bedlîs û Çemişgezek di sed sala 16an û 17an de bi çand, siyaset û ticareta xwe bûye paytextê kurdan, di sed sala 19an de jî Silêmanî bi edebiyat û quweta siyaseta xwe ve cih ji wan standiyê û bûye cihê herî muhîm li Kurdistanê.⁴⁴ Li gor

wergera *Şerefnameya Şeref-xanê Bedlîsî* ya bo zimanê rûsî, di sedsala 16an de, gava amaje bi kurd û Kurdistanê dihat kirin, navê Çemişkezekê dihat hilanîn. Wisa diyar e ku naverok û amajeya navê Kurdistanê tevî wateya wê ya erdnîgarî di nav sedsalên borî de her hatiye guhartin. Ji ber wê yekê, tesewura Kurdistanê ya li derveyî Kurdistanê, li bal osmanî, îranî û ewropîyan li dû mîrgeh û hêza serdest şikl digirt û şikl diguhart. Bi gotineke din, mîrgeh û binemala herî bihêz a Kurdistanê di heman demê de wek navenda Kurdistanê dihatê dîtin an hizrkirin û wisa jî navê “Kurdistan” ji bo wê mîrgehê an herêmê dihatê bikaranîn. Her dîsa, li derve an ji dûr ve, erdê kurdan û Kurdistan herêma di navbera faris, tirk û ereban de bû; lê belê, gava ew kesên ji derve li Kurdistanê nêzîk dibûn û diketine nav cemaetên kurd, wisa hizr dikirin ku mîrgehên herî hêzdar ew in yê ku wan ziyaret dikirin û lê diman.

Paşnot

- 1 Cemal Kafadar, “A Rome of One’s Own: Reflections on Cultural Geography and Identity in the Lands of Rum,” *Muqarnas*, 24 (2007): 7-25 (17).
- 2 Kafadar, “A Rome of One’s Own,” 17.
- 3 Melayê Cizîrî, *Diwan*, wer. Osman Tunç, ed. Ayhan Tek (Ankara: Kùltür ve Turizm Bakanlıđı Yayınları, 2012); Ferhad Shakely, “The Kurdish Qasida,” tê de: *Qasida poetry in Islamic Asia and Africa*. ed. Stefan Sperl, C. Shackle, Nicholas Awde (Leiden: Brill, 1996), 327-338. Spas bo Ayhan Geverî ku ji qenciya xwe ev beyt anî ber nezera min.
- 4 Ehmedê Xanî, *Memozîn*, amd. Arif Zêrevan (Stockholm: Nefel, 2004), 45-46.
- 5 Xanî, *Memozîn*, 47.
- 6 Richard Schofield, “Narrowing the frontier: mid-nineteenth century efforts to delimit and map the Perso-Ottoman border,” tê de: *War and peace in Qajar Persia: implications past and present*, ed. Roxane Farmanfarmanian (New York: Routledge, 2008), 152.
- 7 İbrahim Aykun, “Erzurum Konferansı (1843-1847) ve Osmanlı-İran Hudut Antlaşması” (Teza doktorayê, Zanîngeha Atatürk, 1995), 117-18.
- 8 Sabri Ateş, “Empire at the Margins: Towards a History of the Ottoman-Iranian Borderland and the Borderland Peoples” (Teza doktorayê, Zanîngeha New York, 2006), 123; Aykun, “Erzurum Konferansı,” 39-41.
- 9 Aykun, “Erzurum Konferansı,” 118.
- 10 İlber Ortaylı, “Joseph Freiherr von Hammer-Purgstall,” *İslam Ansiklopedisi*, c. 15; 494
- 11 Katib Çelebi, *Cihannüma*, amd. Fikri Sarıcaođlu (Ankara: Türk Tarih Kurumu, 2007), c. 1; 448-50.
- 12 *Evliya Çelebi Seyahatnamesi*, amd. Seyit Ali Kahraman, Yücel Dađlı (İstanbul: Yapı Kredi Yayınları, 2005) c. 4, 199a.
- 13 Evliya, *Seyahatname*, c. 4; 217b.
- 14 Evliya, *Seyahatname*, c. 4; 326b.
- 15 Eylliya, *Seyahatname*, c. 4; 219a.
- 16 “İnkırâzu>d-devrân Âli Osmân ile şâhı Acem mâbeyninde memâliki Kürdîstân mü’ebbed ola, âmîn, yâ Mu’în.” Evliya, *Seyahatname*, c. 4; 200a.
- 17 Mustafa Naima, *Tarih-i Naima*, amd. Mehmet İpşirli (Ankara: Türk Tarih Kurumu, 2007), c. 2; 899.
- 18 Naima, c. 2; r. 550.
- 19 Serê sedsala 19an, Muhammed Alî Mîrza walîyê Kirmanşah û Kurdistana İranê bû. Gaspard Drouville, *Voyage en Perse fait en 1812 et 1813. Vol. 2* (Paris: La Librairie Nationale et Etrangère, 1825), 220, 223.
- 20 Hakan Özođlu, *Kurdish Notables and the Ottoman State* (Albany, NY: State University of New York Press, 2004), 37. Ji bilî vê, bnr. Meh-

met Alagöz, “Old Habits Die Hard A Reaction To Application Tanzimat: Bedirhan Bey’s Revolt” (Teza lîsansa bilind, Zanîngeha Boğaziçi, 2003).

21 Adrien Dupré, *Voyage en Perse fait dans les années 1807, 1808 et 1809* (Paris: J.G. Dentu, 1819), 91.

22 Li ser mîratiyan Babaniyan binêrin: Metin Atmaca, “Politics of Alliance and Rivalry on the Ottoman-Iranian Frontier: The Babans (1500-1851)” (Teza doktorayê, Zanîngeha Freiburg, 2013).

23 Şanizade Mehmet Ataulah, *Tarih-i Şanizade*, amd. Ziya Yılmaz (Stenbol: Çamlıca, 2008), c. 1; 831.

24 Hinek dîroknivîs dibêjin ku Îbrahîm Paşayê Baban navê “Silemanîye” li dû Süleyman Paşayê waliyê Bexdayê daniye, lewre walî Süleyman Paşa gelek harîkarîya Îbrahîm Paşa kiriye. Abid Rabbi Ibrahim al-Waili, *Tarikh al-Imarat al-Babaniyyah, 1784-1851*, (Şam: Dar ez-Zaman, 2008), 142-143.

25 Stephen H. Longrigg, *Four Centuries of Modern Iraq* (Reading, UK: Garnet Publishing, 2002 [çapa peşiyê University of Oxford Press, 1925]), 159.

26 Longrigg, *Four Centuries*, 247, 249, 287.

27 HAT (Hatt-ı Humayun) #36617-A (19.B.1239/ 20 Adar, 1924), Başbakanlık Osmanlı Arşivleri (BOA)

28 BOA, HAT # 36750-i (17.L.1239/ 15 Hezîran, 1824).

29 Ateş, “Empire at the Margins,” 11, 50.

30 C.NF(Cevdet Nafia)# 959, Folio:20, (8.Ca.1259/ 7 Hezîran 1843), BOA

31 A.MKT (Sadaret-Mektubi Kalemi Ervaki)# 86, Folio: 9 (19.S.1260/ 9 Adar 1844), BOA; A.MKT.MHM. #61, Folio:2, (17.C.1263/ 1 Hezîran 1847),BOA

32 HAT #36750-M (07.L 1239/ 5 Hezîran 1824), BOA

33 HAT # 20815 (08.L.1246/ 23 Adar 1831), BOA

34 P. Maurizio Garzoni, *Grammatica e vocabolario della lingua kurda* (Roma, 1787), 3-5.

35 R. P. Giuseppe Campanile, *Historie du Kurdistan* (cara yêkem sala 1818 li Îtalyayê hate çapkirin; R. P. Thomas Bois li sala 1953yan ew

wergerande ser zimanê fransî), (Paris: L’Harmattan, 2004), 11.

36 Campanile, *Historie du Kurdistan*, 12.

37 James C. Rich, *Narrative of a Residence in Koordistan and on the Site of Ancient Nineveh, 2 Volumes* (James Duncan: London, 1836). Bi taybetî li cilda yekem binêrin.

38 Rich, *Narrative of a Residence*, c. 1; 385-387.

39 *Christian Secretary* (7 Çileyayê Pêşî 1824), 1, 45.

40 Binêrin bi taybetî li “Solymania or Shehrezur” tê de: Richard Brookes, *The General Gazetteer or compendium of Geographical Dictionary* (London: A. Picquot, 1827)

41 William Heude, *A Voyage up the Persian Gulf and a Journey Overland from India to England in 1817* (London: Longman, 1817).

42 HAT #23085 (29.Z.1252/ 5 Nîsan 1837), BOA.

43 Correspondance Consulaire et Commerciale (CCC), Basra nr. 2, 058 in Tom Nieuwenhuis, *Politics and society in early modern Iraq: Mamluk Pashas tribal Shayks and local rule between 1802 and 1831* (Hague: Martinus Nijhoff Publishers, 1981), 42.

44 Cheref-ouddine, *Cheref-Nameh, Fastes de la Nation Kourde, C. II, qisim I*, wer. ji farsiyê bo fransî û şîrovekirin ji François Bernard Char-moy (St. Petersburg, 1870), 5. Li ser Kurdistanê sedsala 16an binêrin: Baki Tezcan, “The development of the use of Kurdistan as a geographical description and the incorporation of this region into Ottoman Empire in the 16th century,” tê de: *The Great Ottoman, Turkish Civilisation. Vol 3. Philosophy, Science and Institutions*, Kemal Çiçek, editörê giştî, Ercüment Kuran, Nejat Göyünc, û İlber Ortaylı, edn. (Ankara: Yeni Türkiye, 2000), 540-53.

Bibliyografya

Ateş, Sabri. “Empire at the Margins: Towards a History of the Ottoman-Iranian Borderland and the Borderland Peoples.” Teza doktorayê, Zanîngeha New York, 2006.

Aykun, İbrahim. “Erzurum Konferansı (1843-1847) ve Osmanlı-İran Hudut Antlaşması.” Teza doktorayê, Zanîngeha Atatürk, 1995.

Brookes, Richard. *The General Gazetteer or compendium of Geographical Dictionary*. London: A. Picquot, 1827.

Campanile, R.P. Giuseppe. *Historie du Kurdistan* (cara yekem sala 1818 li Îtalyayê hat çap kirin; werger bo fransî R.P. Thomas Bois di 1953ê de). Paris: L'Harmattan, 2004.

Cheref-ouddine, *Cheref-Nameh, Fastes de la Nation Kourde, C. II, qisim I*, wer. ji farsî bo fransiyê û şîrove kirin bi François Bernard Charmoy. St. Petersburg, 1870.

Christian Secretary. 7 çileyê pêşî, 1824.

Drouville, Gaspard. *Voyage en Perse fait en 1812 et 1813. Vol. 2*. Paris: La Librairie Nationale et Etrangère, 1825.

Dupré, Adrien. *Voyage en Perse fait dans les années 1807, 1808 et 1809*. Paris: J.G. Dentu, 1819.

Ehmedê Xanî. *Memozîn*. Amadekariya Arif Zêrevan. Stockholm: Nefel, 2004.

Evlîya Çelebi. *Evlîya Çelebi Seyahatnamesi*. Amadekariya Seyit Ali Kahraman, Yücel Dağlı. Istanbul: Yapı Kredi Yayınları, 2005, c. 4.

Garzoni, P. Maurizio. *Grammatica e Vocabolario Della Lingua Kurda*. Roma, 1787.

Heude, William. *A Voyage up the Persian Gulf and a Journey Overland from India to England in 1817*. London: Longman, 1817.

Kafadar, Cemal. "A Rome of One's Own: Reflections on Cultural Geography and Identity in the Lands of Rum." *Muqarnas*, 24 (2007): 7-25.

Katib Çelebi. *Cihannüma*. Amadekariya Fikri Sarıcaoğlu. Ankara: Türk Tarih Kurumu, 2007, c. 1.

Longrigg, Stephen H. *Four Centuries of Modern Iraq*. Reading: Garnet Publishing, 2002, çapa peşiyê ji Zanîngeha Oxfordê, 1925.

Melayê Cizîrî. *Dîwan*. Wergera Osman Tunç, bi edîtorîya Ayhan Tek. Ankara: Kültür ve Turizm Bakanlığı Yayınları, 2012.

Mustafa Naima. *Tarih-i Naima*. Amadekariya Mehmet İpşirli. Ankara: Türk Tarih Kurumu, 2007, c. 2

Nieuwenhuis, Tom. *Politics and society in early modern Iraq: Mamluk Pashas tribal Shayks*

and local rule between 1802 and 1831. Hague: Martinus Nijhoff Publishers, 1981.

Ortaylı, İlber. "Joseph Freiherr von Hammer-Purgstall." *İslam Ansiklopedisi*, c. 15

Özoğlu, Hakan. *Kurdish Notables and the Ottoman State*. Albany, NY: State University of New York Press, 2004.

Rich, James C. *Narrative of a Residence in Koordistan and on the Site of Ancient Nineveh*. James Duncan: London, 1836.

Schofield, Richard. "Narrowing the frontier: mid-nineteenth century efforts to delimit and map the Perso-Ottoman border." Tê de: *War and peace in Qajar Persia: implications past and present*, ed. Roxane Farmanfarmanian. New York: Routledge, 2008, 149-173.

Shakely, Ferhad. "The Kurdish Qasida." Tê de: *Qasida poetry in Islamic Asia and Africa*. bi edîtorîya Stefan Sperl, C. Shackle, Nicholas Awde, 327-338. Leiden: Brill, 1996.

Şanizade Mehmet Atallah. *Tarih-i Şanizade*. Amadekariya Ziya Yılmaz. Istanbul: Çamlıca, 2008, C.1

Arşiv

Başbakanlık Osmanlı Arşivleri (BOA):

HAT (Hatt-ı Humayun)

C.NF (Cevdet Nafia)

A.MKT (Sadaret-Mektubi Kalemî Ervakı)

A.MKT.MHM

Servehî I. Silêmanî di yekem çaryeka sedsala nozdehan de.
 Çavkanî: William Heude, *A Voyage up the Persian Gulf* (1817)



Seliminye, the Capital of Kurdistan.

Servehî II. Rêvîngiya Cladius James Rich ji Stenbolê bo Bexda û Silêmaniyê.
 Çavkanî: Constance M. Alexander, *Baghdad in bygone days: from the journals and correspondence of Cladius Rich, traveller, artist, linguist, antiquary, and British resident at Baghdad, 1808-1821*, (London: J. Murray, 1928)

